



Rihletguzîn:
Mihemed Bilen



Portre:
**OZLEM
BELÇİM
GALIP**



PoPirs:
Berfîn Zenderlioğlu

POPKURD

e-Kovara Populer Kulturê



MIRADY;
**MUZÎSYEN
NE MECBÛR E
BÎATÎ
ÎQTIDARA
GUHDARAN
BIKE**

Kunye

Berpirs û Edîtor

Mistefa Dogan
Omer Bextiyar
Ridwan Xelîl

Rûpelsazî

Ridwan Xelîl

Em berpirsê
hemû nivîsên we ne!

Merheba ji we re!

Em bi kelecana û bextewar in. Lewre em bi kovareke nû ya dijîtal tîn hafa we.

Rojekê em li ser kovarên Kurdî axivîn û me kêmasiya tunebûna kovareke populer kulturê ya Kurdî dît. Me ev rewş rexne kir, lê me got bes bi rexneyan tişt çênabe; lazim e ku em vê valahiyê tijî bikin. Ne ku em jî li enflasyon û îflasa kovarên Kurdî, kovarek zêde bikin...

Dû re me zend û bend badan û me yekser dest bi xebat, plan û programa kovarê kir. Me di serî de got ku em kovareke dijîtal û bêmesref derxin.

Me got em ê kovareke aktuel derxin ku tê de mijarên li ser sînema, muzîk, şano, edebiyat, magazîn û mîzahê hebin û me wisa jî kir. Jixwe hûnê bibînin.


Di POPKURDê de; em dixwazin bêhtir meseleyên aktuel hebin û çavê me lê ye em vê e-kovarê bigihînin asteke baştir. Ev îdiaya me ye.

Helbet em li benda fikr, xebat û piştgiriyan we ne jî.

Herwiha her dem li benda POPKURDê bin, lewre wek qiyametê ne diyar e dê kengî bê weşandin. Yanî kengî xwe amade bike wê demê wê derkeve.

Em zêde dirêj nekin û serê we neêşînin. Ji bo hejmara duyem, niha em ê bixebitin, de bi xatirê we!

EDÎTORÎYA POPKURDÊ



NAVEROK

4

Rihletguzîn:

Gera Îranê

Mihemed Bîlen

10

Reporaj:

Mirady Re Roportaj

Mistefa Dogan

14

Portre:

Mamosteyeke Kurd Li Oxfordê:

Ozlem Belçim Galip

Omer Bextiyar

16

Me Ji 10 Kesan Pirsî

18

Fotoşirove

20

Mîzah:

Provaya Mirina Blogernan

Esrakê

22

Popirs:

Berfîn Zenderlioğlu

23

Mîzah:

Bi Vê Qûşê Naçî Mûşê

Cihan Kaynar

25

Pasaj:

Eta Nehayî

Gulên Şoran

26

Sînema:

“Ji Bo Min Meseleyeke Qelbî Bû...”

Bilal Korkut

28

Poptweet

30

Aktuel:

Habîtûsa Kurdan

Hatice Kiliç

32

Ger

Yêrîvanê Yêrîvan

Tofan Sûnbûl

35

Popnûçe



RIHLETGUZÎN

Mihemed Bîlen

Serpêhatiyeke Polisiye li Îranê

Phileas Fogg, beriya dest bi gešta cîhanê bike û bi hevalên xwe yên klubê re li ser vê yekê têkeve şertekî bêveger, mirina wî dê bihata bîra wî lê ev ger û geşt dê nehata! Her çiqas ji ber rik û inyadê ev bela li serê xwe gerandibe jî, fikra serboriyeke wisa ji bo sermestkirina wî bes bû. Jules Verne di klasika xwe ya polisiye ya navdar a bi navê “Di 80 Rojan De Dewra Alemê” de wiha digot. Wexta mamosteyê min ev kitêb dabû min û min ew xwendibû, li Serêkaniyê di dibistana navîn de bûm. Qehremanê romanê Phileas Fogg û xulamê xwe di 80 rojan de, dê li temamê dinyayê bigeriyana. Ji çavê zarokê 12 salî gava mirov li çîrokê dinihêre, ger û geşteke bi wî rengî him ne pêkan e û him jî pir utopîk xuya dike. Nexasim wekî gelek zarokên Kurd, mirov di nav bêderfetiyan de mezin bûbe û li cihekî wek Serêkaniyê zarokatiya xwe bihurandibe. Wan salan kengî em bi otobosê ji bo ziyaret an jî



nexweşiyekê ji navçeyê ta bajêr saetek rê biçûyana û heta em bigihaştana bajêr, yan wê rojê wê madê me li hev biketa û em ê wek gêjan bûna, yan jî ew rêwîti xerantî dê bi verişînê encam bibûya û li me bibûya jehr. Lewma kengî bahsa çûyina ber bi derekê ve bihata kirin, her çiças kêfa min baniya jî, wekî bergirî û haziriyekê min torbêyê xwe yî naylonî jî qat dikir û dixist bêrika xwe..

Gava Mistefa bo kovara nû ya dijital PopKurd'ê daxwaza nivîsekê ji min kir û xwest ku li ser ger û geştê binivîsim, çûyina min a ewil a Îranê ket bîra min. Her çend piştî Îranê, Avûstralya ne tê de min ji ava hemû parzemînan vexwaribûya jî, ya herî bandor li min kiribû ew bû. Ji ger û geşteke wêdetir macerayeke xeternak, serpehatiyeke polîsiye bû çûyina Îranê.

Tehran

Havîna 2002yan ji bo karekî rapirsîyê berê min ketibû Îranê. Wekî serpehatiya herkesî ya ewil û dûrî mala xwe, kelecaneke ecêb bi min re çêkiribû. Hingê li welatên rojhilata navîn rapirsîyek navneteweyî dihat birêvebirin bi destê şerîkeya Londonî ya navnetewî ya InterMedyayê. Yê rapirsî bi InterMedya dida çêkirin ji organîzasyona televîzyon û radyoya Dengê Emerîkî bû. Wekî hûn ê jî texmîn bikin li Îranê birêvebirina rapirsîyekê li ser navê organîzasyona Dengê Emerîkî dînitî ye. Hîsteriya komara îslamî ya Îranê ya li hember navê Emerîkayê ji roja îro xerabtir bû. Proje ew bû ku bi 15 profesorên zankoyê yên ji Îranê û Başûrê Kurdistanê re dê hevdîtin bihata pêkanîn. Ji ber ku bi salan di nav endustrîya researchê de min kar dikir, hevalekî navê min pêşniyar kiribû. Digel hindêk metirsiyan piştî hinekî li ser fikirîm min kar qebûl kir.

Destê sibê bi balafira bi tarîfe ya THYê gihîştîm Tehranê. Ji ber ku hingê organîzasyonên wek Airbnb, Trivago Bookingê tune bûn, min li tu deverê cih veneqetandibû. Bes hin agahî derbarê hin otêlan de min peyde kiribûn. Otêla

herî navdar Hotel Azadî bû û ez ê jî li wê otêlê bi cih bibûma. Beriya şifêrê texsiyê yê Azerî min bigihîne otêlê çend pirs ji min kirin. Tu ji bo gerê an bo kar hatî? Tu ê çend rojan li Tehranê bimînî filan û bêvan. Berî ez ji texsiyê dakevim bê tereddut pirsê dawî ji min kir. Heger tu bixwazî ez dikarim te bibim cihekî ku Mahra Mûtayê li te bê birîn? Helbet berî hingê min nizanibû bê Mahra Mûtayê çi adet e lê dîsa jî min spasiya şifêrî kir. Dîyar bû li Îranê qewadî bi destê meleyên dewletê dimeşiya. Li gorî şerîeta dewleta Îranî heger jinek bi mahreke çendrojkî bi mêrekî re razaya ev ne guneh bû.

Roja xwe ya ewil min li parka Mel-lat û li kolana ValiAsr ji bo naskirina derûdorê buhurand. Dirêjtirîn û navdar-tirîn kolana Tehranê ye ValiAsr, dirêjiya kolanê 17km ye. Ji bo meşê kolaneke hew dibe, bes ku qidûmê we zû neşike û ku hûn bêteqet nemînîn. Li ValiAsrê li restorana ku min xwarin lê xwaribû garson bîraya îslamî jî jimartibû di nav vexwarinan de. Berî hingê min li tu derekê bîraya îslamî nebîhîstibû, aqlê min nedigirt bîra çawa karibû bibûya îslamî. Jixwe fena navê xwe wekî jehrê bû! Ji xwarinên Îranê Abguşt a herî navdar û ya herî bi lezzet e û birinca bi safran para zêrîn a ji metbexa Îranê ye. Û helbet divê mirov berî mirinekê Fesenjanê tahm bike ku bi goştê werdekê tê çêkirin.

Li sûka Tecrîş a dîrokî ya Tehranê wekî go karnavalek lê hebe bi liv bû. Wesaitên nav bajêr wekî go mirov li vîdeoyeke time lapse kirî temaşe dike bi lez û hereket bûn. Tiştê din a bala min kişandibû ew bû ku li kuçeyên Tehranê dîtina seteke filîman pir normal bû, di nav rojekê de we karibû li çend cihên cuda pêrgî setên sinemayê bihatana. Li restoraneke kevin a Tehranê li ser dîwarekî mezin bi seramîkan wêneyê kalemêrekî hatibû çêkirin. Wexta min ji xwediyê restoranê pirsî bê çi kes e; gotibû şairê gewre yê Kurd Baba Tahirê Uryan e, bersiva wî kêfa min anîbû. Li her derê bajêr mirov dikaribû pêrgî navê



Baba Tahirê Uryan

şairên wek Hafiz, Firdawsî, Sadî û Omer Xeyyam bihata.

Roja duduyan li taxa Velancak min berê xwe da balyozxana Başûrê Kurdistanê ku Dr Pîrot Îbrahîm balyozê wê bû. Wî ez bi xêrhatineke ji dil pêşwaz kirim û ez ezimandim. Ji ber ku bi silava sefîrê Enqerê Sefîn Dizayî çûbûm balyozxanê, cîh tunebû min lê dayne. Ew dê alîkariya min a çûyina Başûrê Kurdistanê bikira.

Kesên ne hemwelatîyê Îranê ne û ji derve wekî turîst hatine Îranê hivza xwe ji asayîşê dikirin, gava çav li polîsan diketin berê xwe diguhertin. Ji pirsên rapirsiya ku dê bi mamosteyên zanîngehê re bihata kirin, dihat famkirin ku şerekî mezin li benda Iraqê ye. Ji her çend pirsan carekê pirsin hebûn ku xwe dubare û sêbare dikirin. Pirsên wekî: Heger şerekî mezin li rojhilata navîn, li Îran an jî li Iraqê destpê bike hûn an jî millet dê kîjan

çavkaniyan wekî rojname, radyo û televîzyonan bişopînin. Hûn ê baweriya xwe ji kîjanan ji wan bînin. Kîjan rojname, radyo û televîzyon bêhtir dihatin tercîhkirin hwd. Sînyalên şerê Iraqê bûn ev pirs, lê bes ya xerîb, xeberên mudaxaleya Emerîka bo Iraqê di rojeva tu tora medyayan de nedigeriya.

Bi tena serê xwe çûyina welatekî nenas ne hêsan e, tew bi ser de kesî mirovî nas li ser wê erdê tune be. Piştî civînên bi çend mamosteyên ji zankoyan, roja min a pêncemîn bû li Tehranê. Li Stenbol konsêrta Kamkaran ji aliyê NÇMyê ve berî çûyina min a Tehranê bi çend heyvan hatibû lidarxistin û min çend endamên komê li wir nas kiribûn. Navenda Çandê ya Hesên Kamkar li Tehranê bû, him bo serdanê, him jî bo erbaneyeke diyarî bo dostekî bistînim û bi Bîjen Kamkar bidim îmzekirin min da ser riya navendê. Li navendê hemû endamên malbata Kamkaran pol bi pol dersên muzîkê didan şagirtên xwe. Di bêhnvedana navrojê di firavîne de li gel malbatê em rûniştin û Bijen Kamkar erbaneyeke imzekirî diyarî kir bo hevalê min. Wênekêş Savaş Boyrazê beşê sînemaya NÇMyê jî bi tesadufî li Îranê bû û em bi hev re çûbûn navenda Kamkaran. Bi Savaş re albûma Xak ya Meryem Îbrahîmpour jî me li wir, bi wê dabû îmzekirin. Albûm du sal berê derketibû û bandorek bêhevta li me gişan kiribû.



Li navenda Hesên Kamkar



Şeveqa roja heftemîn balafira min hebû bo biçim Êrmiyeyê. Bi arîkariya balyozê Kurdistanê yê Tehranê Dr. Pîrot Îbrahîm û li gor plana wî danî, divê ji Êrmiyê biçûma Naxedê, li Naxedê de nûnertiya PDKyê alîkariya min bikira û li ser piştta hespan em ê biçûna Slemani, ji Slêmanî bo Hewlêr, ji Hewlêr ji bo Duhokê, helbet tim ne li ser hespan, carinan jî bi wesaîtan. Bi heman şiklî jî dê vegeyriyama. Ji ber ku çûyina Başûrê Kurdistanê demeke dirêj bû ji aliyê Tirkîyê ve hatibû astengkirin. Tenê ev rê hebû. Rêyeke dirêj li bendî me bû. Bi dengê melê sibê em li hespan siwar hatin û me berî dan kaşan, wekî ku di filimê “Dema Hespên Sermest” de bim û wekî go wextî pasdar dê bi pey me kevin bi tirs bûm. Rêberê me Şêrzad bi tecrûbe û ji xwe bawer bû, rê û tirsê çavê me, wî jî çavê tirsê şikenandibû.

Slêmanî xweş Slêmanî!

Wexta em gihaştin nav bajêr em ji halekî ketibûn halekî din. Di her sê rojên hevdîtinan ên li Silêmanî, wisa dihat fêmkirin ku akademîsyenên Kurd wekî pêşbînî hay ji mudaxaleyêke ciddî hebûn û ji pirsên forma rapirsîyê bêhtir hêvîdar bûbûn. Azadî nêzîk e. Heger Dengê Emrîkî van pirsan ji me dike, ne belesebe e, haziriyek e tê kirin, digotin. Mafdar bûn jî!

Hewlêra zêrîn

Li qehwexaneyê Miçko li bin kelehê Hewlêr kelekela havînê, ji mehan gelawêj e. Her cara çay tê ser masê her qedeheke çayê olçekê şeker dikşîne nava xwe, kevçî di şeker de diçikin. Bazara Qeyserî wekî her wext di nav toz û gelemşeyê de ye. Heçî kesên Hewlêrî ku pêdiviya wan ji tiştêkî çêdibe berê xwe didin vê bazara kevnare ya bin kelehê. Tunebûn û feqîrî li her derê devê rêya mirov dibire û xwe rê dide, lê digel hemû van tiştên negatîf xweşikiyêke biçûk têra bextewarkirina mirovan dike.

Ji ber ku wextê vegeyriyê hêdî hêdî nêzîk dibe, hevdîtinên li Duhokê divê bihata kirin li Hewlêrê em pêk tînin.

Veger ji hatinê hêsantir bû. Piştî vegeyriyam Tehranê karê min tamam bibû û ez jî têr westiyabûm.

Ji markêta muzîkê ya navdar ya Beethoven min hemû CDyên Muhammed Rîza Şeceryan û Şehram Nazirî stendin û êdî saeta vegeyriyê bû. Wexta balafira vegeyriyê bi jor ket diyar bû ku tesîra wê rêwîtiyê li ser min hê wê gelekî devam bike..

Ji bo min êdî berî çûyina Îranê û piştî çûyina wê hebû. Bi hêviya her kesê ku ji gerê hezdike rojekê bikare wekî Phileas Fogg dewra xwe ya cihanê tamam bike.



©Esrakê



"Pereyên xelkê hene, reklaman dîdîn heyra!"



PERXUDRES*

*perwerî ye bi ro, bi şev xudreste!

Mirady bi albûma 'Xweli'yê derket pêşberî guhdarên xwe.

Em dizanin ku ew kêr roportajan dike lê em neşikandin û teklîfa roportaja me qebûl kir.

Em çûn cem Mirady û pê re li ser muzîka wî, tîkiliya edebiyat û muzîkê û gelek tiştên din peyivîn.

Birêz Kerem Sevinç jî di roportajê de amade bû.

Mala wî ava.



MISTEFA DOGAN
mistefadogann@gmail.com

Heke cover baş bê kirin,**afirandinek e**

-Dibêjin di van salên dawî de muzîsyenên Kurd kêmtir diştan diafirînin û li dû coveran diçin. Tu çi dibêji?

“Dema em behsa afirandinê dikin çî tê bîra me, ya muhîm ev e. Esasen cover jî afirandinek e. Car caran cover jî çêkirina stranekê zehmettir e. Ger cover baş bê kirin, afirandinek e.”

“Muzîsyen ne mecbûr e**bîatî îktidara guhdaran bike”**

Bi te di muzîka Kurdî de problema kalîteyê heye?

“Guhdarên muzîkê jî civakek e. Ew civak car caran dibe îktidar û ew îktidar hin caran zorê dide muzîsyenan. Muzîsyen ne mecbûr e bîatî îktidara guhdaran bike û muzîka xwe li gorî wê çêke.”

Tu xwe di nav kîjan nifşê muzîkê de qebûl dikî?

“Ez di navbera nifşê niha û yê berî vê de me.”

-Tu dikarî di nabeyna herdu nifşan de miqayesekê bikî?

“Nifşê berê dikaribû kolektîf bixebite û bi rastî jî “îzm” di xwe de hebandibûn. Ji aliyê afirandinê, nifşê niha jî gelek baş e, lê qadeke berfireh tune ye ku xwe nîşan bidin. Jixwe ‘afirandin’ bi tena serê xwe meseleyeke kûr e. Lê hin muzîsyenên nû, dema tiştê dikin dixwazin wekî “karê ewil” nîşan bidin. Yanî wek ku beriya wî/ê tu kesî ev tarz nekiribe, tevdigerin. Mixabin hin ji wan naxwazin bêjin ku ji kê tesîr jî girtine.”

-Di dawîya salên 90î û serê 2000an de, navenda muzîka Kurdî Stenbol bû. Lê niha Diyarbekir jî bûye navendeke muzîka Kurdî. Mîsal tu li Diyarbekirê dijî. Ev bajar têra te dike?

“Erê dike, ji ber ku kokên me li vir in. Ya rast ez ne muzîsyenekî ewqas bi kokê xwe ve girêdayî me. Bila ev gotina min

şaş neyê fêmkirin. Qesta min jî vê gotinê ev e; dema ez tiştêkî çêdikim naxwazim tekrara hin tiştan be. Çavkaniyên muzîsyen li ku bin, lazim e li wir bijî lê ev ne li ser mekanê ye. Ne hewce ye îlleh li welêt be. Mîsal li diasporayê jî bo muzîka Kurdî xebatên gelek baş hatin kirin.”

**“Ez stranên xwe çêdikim****û xwe didim alî”**

-Mirady gelek kêmtir dipeyive, kêmtir roportajan dike, gelek kêmtir konseran çêdike, ne pir ‘medyatîk’ e. Çima?

“Ez stranên xwe çêdikim, datînim ber guhdaran û xwe didim alî. Ez jî vê hez dikim. Konserên stabîl, yê wekî hev bi ya min bême’ne ne. Dibe tekrar û ez jî vê hez nakim. Bi ya min roportaj û konser car caran mesafe dixin navbera muzîsyen û guhdaran. Lazim e guhdar li ser berhema me bipeyivin, ne em. Ger ez xeber bidim ew bi demê re diçe ber bi narsîzmê ve. Jixwe muzîsyen bi xebata xwe gotina xwe dibêje, hewce nake mirov zêde li serê biaxive.”

- Em hêdî hêdî werin ser albuma “Xweli”yê. Di vê albumê de helbestên Mîtan Şareza û Selîm Temo hene. Di albuma “Xemname/Gamnameyê” de jî helbesteke Arjen Arî hebû. Herwiha gotinên strana ‘Baranek’ê, şa’ir Osman Mehmed nivîsibû. Ji bo te têkiliya



edebiyat û muzîkê çawa ye?

“Ev ne projeyek e ji bo min. Hin muzîsyen vê wek proje dikin. Mîsal Nî-zamettîn Arîç bi taybetî li ser helbestan xebatan dike. Yê min ne tişteki wisa ye. Heke helbest li dilê min rûnê ez çêdikim.”

“Helbest çi qas li dilê min, ruhê min rûnê ez wê ewqas dihebînim.”

-Gelo tu di helbestê de li dangan digerî an dema dixwîni ew deng ji nişka ve tê guhê te?

“Ez di nav helbestê de him li me’neyê him jî li stranên nav helbestê digirim.

Helbest çi qas li dilê min, ruhê min rûnê ez wê ewqas dihebînim. Beri niha min helbesta Metin Altîok a “Miriye Bênasname” kiribû stran.”

- Arjen Arî ji bo Mirady çi ye?

“Min Arjen Arî nas dikir. Ez ji şa’iriya wî gelek hez dikim. Min ji helbesteke wî ya din jî besteyek çêkir, hevalê me Egîd Işık dê di albûma xwe de bibêje. Bi ya min di helbesta Arjen Arî de gelek deng hene. Loma jî Arjen Arî ji bo min cuda ye.”

-Tarza vê albumê piçek cuda ye. Navê vê tarzê heye?

“Na. Yanî nizanim hewce dike mirov navekî lê bike? Ya baş bila her kes li gor xwe navekî lê bike.”

-Di albumê de mirov tesîra şer hîs dike, dikarî qala vê bikî ji me re?

“Min gelek çîrok bihîstin, bi çavên xwe jî gelek tişt dîtin. Ya rast ev album jî çavên min teswîra vî şerî û ya vê atmosferê ye jî.”

-Di albumê de piraniya stranan yên te ne, tu mamostetiyê jî dikî. Tu çawa wext dibînî ji muzîkê re, bi xêra xwe behsa jiyana xwe bike?

“Naxwazim behsa jiyana xwe bikim.”

“stran jî, hest jî diguherin”

-Te di strana “Marmasiyê” de gotibû

“Ramûsanên xwe helal ke.” Di “Xenîm”ê de dibêjî “Ramûsanên min xenîmî te bibin.” Çi bû?

“Her albûm çîroka heyameke heyata me ye. Li gorî wê helbet stran jî, hest jî diguherin.”

“Em reşikên le’netî ne”

-Muzîsyenên Kurd çima nikarin konserên mezin çêkin? Ewqas guhdarên wan hene lê çima neçar dimînin ku li cihên biçûk konseran bikin?

“Ji ber ku em reşikên le’netî ne.” (Em dikenin)

-Ji bo siberojê çi difikirî?

(35 saniye difikire) “Her tişt pirr bême’ne ye.”



PORTRE:

Mamosteyeke Kurd li Oxfordê:

OZLEM BELÇİM GALİP




OMER BEXTIYAR
sonmezomer21@gmail.com

Mamosteyeke Kurd li Oxfordê

Kesên ku bi lêkolînên edebiyat û romana Kurdî eleqadar dibin teqez navê wê bihîstine. Lewre ew li Zanîngeha Oxfordê yekem kes bû ku dersên zimanê Kurdî da destpêkirin. Herwiha bi Abidin Parilti re kitêba bi navê “Kürt Romani Okuma Kılavuzu” (Rêbera Xwendina Romana Kurdî) amade kir. Wê demê di rojname û kovarên Tirkî de li ser pirtûkê gelek nivîs û şîrove hatin nivîsîn. Galip, niha li heman zanîngehê xebatên xwe yên li ser edebiyat û romana Kurdî û Ermenî didomîne. Herwiha xebat û lêkolînên wê yên li ser jinên Kurd ên penaber jî dewam dikin. Em ê di hejmara ewil a e-kovara xwe de portreya akademisyen û nivîskar Ozlem Belçim

Galip binivîsin. De îja kerem bikin werin em bi hev re vê jina zîrek û jêhatî binasin...

Akademisyen û pispora edebiyata Kurdî Özlem Belçim Galip, di



sala 1982yan de li Şirnexê çêbûye. Li Zanîngeha Selçukê ya Qonyayê di beşa Ziman û Edebiyata Îngîlîzî de lisans û lîsansa bilind xwend. Piştî zanîngehê demekê mamostetiya Îngîlîzî kir. Di sala 2008an de li Zanîngeha Metropolitan a Îngilistanê li ser “Edebiyat û Modernîzm”ê mastira xwe qedand. Piştî mastirê li Zanîngeha Exeterê di beşa “Xebatên Kurdolojiyê” de, li ser romana Kurdî dest bi doktorayê kir. Piştî re bo postdoktorayê derbasî yek ji zanîngehên herî kevnare û bi prestîj, Zanîngeha Oxfordê bû. Herwiha di sala 2010an de bi Abidin Parilti re kitêba bi navê “Kürt Romanı Okuma Kılavuzu” (Rêbera Xwendina Romana Kurdî) nivîsand. Pirtûk di Berfanbara 2010an de ji nav weşanên Sel’ê derket. Kitêb 302 rûpel in û tê de ji sedî zêdetir romanên Kurdî hene. Di vê xebatê de Galip û Parilti analîza naverok, mijar, ziman û forma vegotina romanên Kurdî kirine. Pirtûk ji bo xwînerên romana Kurdî wek rêberê ye. Ji bo paşeroj û pêşeroja romana Kurdî çavkaniyek e. Gelek nivîskar û xwînerên Tirk, bi saya vê xebatê hay ji edebiyat û romana Kurdî bûn. Di pêvekên kitêban ên rojnameyên wek Taraf, Radikal, Milliyet, Vatan, Birgün û Agosê de li ser “Kürt Romanı Okuma Kılavuzu”yê gelek nivîs û şîrove hatin kirin. Kesên ku dixwazin xwe bigihînin van nivîsan bila keremî vir bikin: <http://www.selyayincilik.com/kitap/kurt-romani-okuma-kilavuzu-692>

Li Zanîngeha Oxfordê Dersên Kurdî

Di sala 2013yan de li Zanîngeha Oxfordê cara yekem tişteke qewimî. Serlêdanên Ozlem Belçim Galip û hîndekarê beşa Xebatên li ser Ermenîyan Prof. Dr. Theo M. Van Lint a ji bo dersên Kurdî hatin qebûl kirin. Bi vî awayî li Zanîngeha Oxfordê dersên Kurdî dest pê kir. Wê demê xwendekar û mamosteyên unîversîteyê eleqeyeke gelek mezin nîşanî dersên Kurdî dan. Kontenjan 15 kes bû, lê bi sedan kesan serî lê da. Heta hin kesên biyanî ji ber ku di bin tesîra sînemaya Behmen Qubadî



de mabûn, dixwestin zimanê orijînal ê filmên wî, yanî Kurdî hîn bibin. Lewre sinema tişteke gerdûnî ye û tesîrê dide mirov û civakê. Galipê piştî postdoktorayê, berê xebatên xwe yê akademîk piranî da ser romana Kurdî û Ermenî û xebatên li ser jinan.

Xebata Wê ya Dawî: “Wênêkirina Kurdistanê: Nasnameya Çandî û Civakî”

Niha ew li Enstîtuya Civakî û Çandî ya Zanîngeha Oxfordê mamostetiyê dike. Xebata dawî ya Galipê bi navê “Imagining Kurdistan: Identity, Culture and Society” (Wênêkirina Kurdistanê: Nasnameya Çandî û Civakî), ji nav weşanên I.B. Taurisê derket. Di vê xebatê de Galip, li ser jinên koçber ên Kurd ên li pênc welatan; Îngilistan, Frensa, Belçîka, Elmanya û Swêdê disekine. Li sedemên koçkirin û sîrgûna wan dikole.

Nivîskar û akademîsyen Galip, xebat û lêkolînên xwe yê li ser Kurd û Kurdistanê berdewam dike.

Ji bo me cihê şanaziyê ye ku jineke Kurd li zanîngeheke mezin û bi prestîj, li ser edebiyat û kultura Kurdan xebatan dike. Em wek e-kovara POPKURDê jê re serkeftinê dixwazin.

ME JI 10 KESAN PIRSÎ:




**Bi te kijan Kurd dikare
Xelata Edebiyatê ya Nobelê bigre?
Bo çi?**



Nûhat Deştî:

Evdila Peşewê ku di helbestên xwe de -wekî gelek helbestvanên Kurd- qala eşq, welêt, welatparêzî, pirsgirêka yekîtiya Kurdan, êşa xerîbî û xurbetê û hebûnê dike bi şeweya helbestên xwe di asta helbesta cîhanê de ye. Evdila Peşew wek helbestvanekî gewre yê Kurdan hêjayî xelata Nobelê ye.



Krîstîn Ozbey:

Ku Xelata Nobelê bidine Kurdekî/ê, bi ya min bêguman divê ew Bextiyar Elî be. Bextiyar Elî, bi qasî romanên wî yên ku min xwendine derûniya Kurdan bi zimanekî efsunî û car bi car bi rastiyeke tahl dinivîse. Milletekî ku zimanê wan jî mîna welatê wan perçe bûye di romanên wî de bi vegotînekê tije şifreyên xurt dibe perçeyek. Bextiyar Elî bûye dengê milletekî di nav şer de ewqas sal maye û dev ji çand, ziman,

welatê xwe û aştiyê bernedaye. Axlemîn jî bi romana “Apê min Cemşîd Xan ku her tim bê ew li ber xwe dibir” û “Hinara Dawî ya Dinyayê” dikare bibe berendam. Hema tenê ev hevoka di “Hinara Dawî ya Dinyayê” de ji bo girtiyekî azadiyê ku piştî 21 salan azad dibe, li ser beyabanê teswîr dike, têr dike ji bo Nobelê; “Wê sehayê ez kirim qûm, qûmekê tazî, qûmekê ku êdî tu tişt nikare wê bide ser hev.”



Semra Güçlü:

Bi ya min divê Bextiyar Elî bistîne, ji ber ku teknîkên ku bi kar tîne û zimanê wî gelekî tekûz e. Mirov wexta kitêbên wî dixwîne têdigihê ku bi matematikeye pir qeyîm stûnên teksta xwe bi cî kiriye, ev yek jî dike ku bala meriv tim li ser tekstê be û jê nede alî. Herwiha, ji teknîkên “fictionê” gelekî fahm dike û xweş bi kar tîne ku di nav cîhana wêjeyê de û nav zaneyên vî îşî de berbelav in. Û dîsa ji ber ku ji pizava realîzma efsunî îstifade dike û vê yekê di tekstên xwe de baş bi cih dike; bi ya min gelekî serkeftî ye, dibe sedem ku ew bibe xwediyê xelata Nobelê. Dîsa tişteki din jî, di metnên wî de “navmetnî” gelekî girîng e û ew di bikaranîna vê teknîkê de jî biserketî ye.



Erol Şaybak:

Ev pirsî meşhûr û ne-meqbûl me zêde zêde bêhteng dike, niza'm ji ber çî ye. Her dildarê edebiyatê baş dizane ku xelata

Nobelê didin wan zimanên “xudan-dewlet”. Piştewaniya hikumetekê ji bo edebiyata me elzem e. Îro ro, Kurdiya me ya malê, ji ber derbên xedar yên dagirkeran, hema bêje nivkuştî ye. Ma çima Nobelê bidin zimanekî birîndar? Her lefza nivîskî -çî Soranî çî Kurmancî çî jî Kirdkî- beriya xelateke navdar divê bibe xudanê piştewanekî qewî û statuyeye resmî. Keyn ji van şertûmercan, eger em gihîştin mirada dilê xwe û bi xeletî (?) Nobel dan edîbekî Kurd, ji miriyan Ehmedê Xanî, ji zindiyar Occo Mahabad, ji Soranan; Evdila Peşew, ji Kurmancan; Şener Özmen, bi her kîte û kelîmeya xwe, hêjayî vê xelatê ne. Ema yek heye ji zû de axaftina xwe ya Nobelê hazir kiriye û li bendê ye: Bnr. “Pirça Winda”. ‘Esas, hemî ş’air û edîb û nivîsendeyên Kurd li benda vê xelatê ne (di dilê xwe da) lê ji nav ewqas qiyameta Kurdan tenê axaftina Mihemed Şarman hazir e. Ev jî ‘eyba me ye. (Pirsî we zehf m’ênîdar e...)



Rûken Hekaryan:

Ger rojekê nivîskarek Kurd Nobelê bistîne ew ê teqez Bextiyar Elî be. Romanên wî ji romanê zêdetir şahidên serdemên dîrokî ên Kurdan dikin.

“Romanên wî xwediyê tewneke resen in” (Hevoka Zilkif Ergün e). Bextiyar Elî, bi ziman û şewaya xwe ya cihêreng ku mirov dibêje qey bûyerên rast in, metaforan ji metaforbûnê derdixîne. Wek firîna Apê Cemşîd. Min teqez bawer dikir ku eve çîrokek rasteqîn e û Apê Cemşîd yekî wisa bû ku hertim bayê ew li ber xwe dibir. Romanên wî hem ji aliyê dîrok û jiyana Kurdan ve, hem jî ya Rojhilata Navîn ve têr û tijî ne. Nêçîrvanê girêyan e. Bextiyar Elî xwediyê cihneke cûda ye ku vê bi hostatî vedibêje. Bo min roman jiyîna tiştî ku dixwînim e, Bextiyar Elî jî vê tehmê ji heddê xwe zêdetir bi min didet hîskirin.



Evdî Hesqera:

Berhemên kê bêhtir bên wergerandin, ew ê Nobelê bigre. Dibêm qey herî zêde romanên Bextiyar Elî hatin

wergerandin.



Hîvran Bayat:

Bi min ew kes Bextiyar Elî ye. Ji ber ku roman û pirtûkên wî ne tenê ji bo kurd û kurdistanîyan e. Di vebêja Bextiyar

Elî de metaforên wiha efsûnî û her wiha jî rasteqîn hene ku, şîroveyan van tiştan bi takdîra xwendevanan xwe nîşan dide û diguhere. Ji van pêştir jî nivîskarê me ji alê afirîna karakteran ve gelekî serkeftî ye, kesên ku pirtûkên wî xwendibin, ne mumkin e ku qehramanên romanên wî jibîr bikin. Meriv dizane ku ev roman û karakter bi mêjîyekî layiqî hemî xelatan tên nivisandin.



Emerîkê Sidiqayê:

Xelata Nobelê ne tenê pîvana edebiyata milettekî ye, pîvana edebiyata dinyayê ye. Lazim e berhemeke wisa

bête afirandin ku bi terz, şewê û naveroka xwe ve çixireke nû ji edebiyatê re vebike. Ango li gorê qaîde edebiyatê bêqayde be! Lewra ne tenê di beşa wêjeyê de di beşên din ên ku hêjayê Xelata Nobelê tene dîtin, keşifên terr û teze ne. Vêca keşifeke wiha di edebiyata Kurdî de kî/ê çêdike, ku ji edebiyata cîhanê re kap biavêje?

Bi ya min be Kawa Nemir di vî îşî de gelek serkeftiye. Kawa, ne ku tenê di edebiyata Kurdî de, di edebiyata cîhanê de jî çixireke terr û teze ye. Çima? Lewra edebiyata Kawa; terz û şeweya xwe ve harmoniya edebiyata Rojhilat û Rojava ye. Heta niha di edebiyata dinyayê de kêk kesan li vê harmoniyê ceribandine. Ceribandina vê yekê şarezatiyeye dixwaze ez dibêjim şarezatiya Kawa Nemir têra vê meselê dike.



Pınar Kaya:

Dikarim bêjim Bextiyar Elî. Di warê edebiyata Kurdî de, bi ziman û vegotinê xwedî tarzeke cuda ye. Pirtûkên wî bi şêwazeke herikbar balê dikşîne û meriv naxwaze ji destê xwe deyne. Helbet bi du sê hevokan nivîskariya wî nayê nirxandin lê ev rastiyeke e ku wêjeya Kurdî bi nivîskarên weke Bextiyar Elî wê di asteke bilind de cî bigire.



Abdulhakim Baş:

Li gor min Xurşît Mîrzengî hêja ye. Krîterên Xelata Wêjeyê ya Nobelê çî dibin bila bibin ger mijar bibe wêje li gorî min raste rast mijar dibe ziman lewra wêje bêziman nayê kirin. Jixwe ji van krîteran yek jê jî bikaranîna şêwaza ziman e. Ji çaxa dinya avabûye û heya roja me kî zane bê çend ziman ji ser rûyê dinyayê têk çûne. Kîjan ziman li ber mirinê be divê wêjekar li ser van zimanan berhemana biafirîne ku ew ziman bi her awayî dewlemendiya xwe biparêze. Lewra wêje dewlemendiya ziman derdixe holê. Li ser van fikran bi qasî min xwendiyê nivîskar Xurşît Mîrzengî jî dewlenendiya Kurdî di berhemên xwe de bikar tîne. Ev yek nayê wateya Kurdî li ber mirinê ye lê ji ber ku Kurdî dibin ewqas politikayên qirêj de maye û ji aliyê Kurdan jî her ku diçe kêmtir tê axaftin, têkûz û dewlemandiya wê jî tê jibîrkirin. Nivîskar bi kîjan zimanê dibin zilmê de be, berhemên hêja û tekûz binivîse divê ew Xelata Wêjeyê ya Nobelê bidin wî nivîskarî. Li gorî min jî brêz Xurşît Mîrzengî jî bi Kurdiya resen û xwerû dinivîse û ew û berhemên wî hêjayî Xelata Wêjeyê ya Nobelê ye.

FOTOŞÎROVE

SÛLAVA XELEF Û ÇÎROKA WÊ

Sûlava Parmûk an jî bi navekî din sûlava Xelef yek ji sûlavên Çewlîgê ye ku bi serpêhatî û çîroka xwe him balê dikşîne ser xwe hem jî bi salan e bê west û rawest dikişe û hey dikişe.

Sûlava ku havînan bo geşt û ger û wê-negiriyê dibe mekaneke xweş zivistanan jî diqerise û dimenên krîstalî û nebinayî pêşkêşî niştecihên gund û hezkiriyên xwe yên derve dike, lê her çiqas bi van dimenên xweş li ber çavan be jî di esase xwe de çîrokeke dilşewat jî din av xwe de dihewîne.

Sûlava ku hetanî demên dûdirêj navê gund lê bû piştî mirina kesekî navê xwe jî mînanî qedera xwe diguherîne, li gorî saloxên gundiyan mesele wiha rû dide; “Rojeke kesekî bi navê Xelef bo hinekî bêhna xwe vede û kêliyekî hênikahiye de rûnê çûye li ser sûlavê, lê qedera kambax lê hatiye xezebê û Xelef jî sûlavê ketiye xwarê û xeniqiye. Termê wî yê ku bi dehan metreyan xişikiyaye paşê jî aliyê gundiyan ve hatiye dîtin. Êdî jî wê rojê û vir ve navê vê derê bûye Sûlava Xelef.

Çûnûhatina Sûlavê:

Ev gundê ku girêdayî Çewlîgê (Çolîg, Bîngol) ye bi qasî 20 deqîqeyan ji navenda bajêr dûr e. Ji nav bajêr meriv dikare bi wesayîten gund û bi erebeyên xwe yên şexsî here gundê Parmûkê (Çavuşlar) û li vir Sûlava Xelefê bibîne.

Debara Gund:

Debara gund bi heywandarî û çandinîyê dibe û hin gundî sewa xebatê diçin derveyî bajêr jî.

Zaravayê Gundiyan:

Piraniya niştecihên gund Kirdkî axêv (Zazakî axêv) in û gelek ji wan Kurmancî jî baş dizanin. Her wiha li gund Girê Keçel, Ava Serkaniyê û Aşê Kevir jî hin cihên hêjayî dîtinê ne.



MEM ARTEMÊT

memartemet65@gmail.com

Kunyewêne:
Wêne: Mem Artemêt
Dem: Nîsana 2016an
Cîh: Gundê Parmûka Bîngolê
Navê wêneyê: Sûlava Xelef û Çiroka Wê



Provaya Mirina Blogernan

-Stenbol 2090-

Zivistana 2018an bû. Wê demê di navbera Diyarbekir û Stanbolê de teyare diçûn û dihatin. Rê 2 seat bêhtir dewam dikir, ne wekî niha jet bûn û rê ne 20 deqe bûn.. Xebera min çêbû ku Omer hatiye Stenbolê. Wê demê pir ciwan bû û pir qeşeng bû maşalla. Bloggeriya Kurdî nû nû xurt dibû. Me serê xwe gelekî li ser mijara ku em Blogeriya Kurdî çawa bi pêş ve bixin diêşand. Bi rastî demekî zehf zehmet bû. Blogerê me Xalê Zinar hê sax bû û bloga wî reqorên tikandinê dikirin.

Axir ez ji kar derketim û li metrobusê siwar bûm. Di rê de jî min xeberên li ser Efrînê dixwendin. Rusyayê dîsa wek van rojên ku em tê de ne ixanet li me kiribû. Wê demê ji ber em bê dewlet bûn em pê

gelekî diêşan. Niha elhemdila dewleta me jî heye. Di wan deman de googleyê bê ewle, reklam ne dida bloggerên Kurd. Hingî min nivîsek şand ji bloga Omer re. 25 lirayê wî zemanî wek 100 €'yê niha bû. Heft xwezî bi wî zemanî. Ez gihîştim Caddeya îstiklalê, min û Omer cara yekem bû me hev didît. Hûn zanin ku wê demê Stenbol di destê Dewleta Tirk de bû. Ez ne şaş bim me li devê Liseya Galatasarayê hev dît. Niha bi navê Akademiya Şairan a Arjen Arî tê zanîn.

Wê rojê ez û Omer çûn cem rehmetiyê Hamid Omerî. Mala wî li Uskudarê bû wê demê. Ji xwe camer piştî Celadet Bedirxan Kurdê duyem bû ku hatibû Stenbolê. Behsa wan rojên kevin dikir. Wê rojê Omer biryar da ku piştî Rohat Alakom-“İstanbul Kürtleri”, ew jî pirtukekê binivîsê û jiyana û qala jiyana rehmetiyê

Hamid Omerî . Rehmetî ji me re behsa mijarên pir giring kir. Ji xwe di pirtuka Omer de hûn dikarin bibînin. Bi rastî jî ew roj pir zehmet bûn.

Wê demê bi keştiyan em diçûn û dihatin li Stenbolê. Em li keştiyê siwar bûn me xwe kar kiribû ku em herin cem Mem Jan. Ji çavê xwe emeliyat bûbû. Berî întixar bike ez dibêm 5 sal filan bû. Jixwe piştî intixara wî em çûn, me hemû nivîsên wî me kirin pirtûk û hat çapkirin. Di depresyonê de bû, textor gotibûn depresyonê avetiye çavê wî. Wê demê depresyon di nav Kurdan de pir populer bû. Yê ku derb lê tanî diket depresyonê de.

Hê wek îro ew roj têne ber çavê min. Ez Omer û rehma xwedê lê be Mewlud, em li Leylek qafeyê rûniştin. Mewlud di ciwaniya xwe de bi xwîneriya xwe bûbû şohret. (ez dibêm heta wê demê kes bi xwîneriya xwe ewqas meşhûr bûbû. Di wê derbarê de Mewlud numuneyek bû.) Wê demê Înstagrama wî bûbû manyaxa favan. Me qala gelek tiştan kir. Wê rojê Omer henek kir û got “pêşî wê Mewlud mirê pişt re ez, di dawiyê de wê Esrakê mêne. Heqîqeten wilo çêbû. Erê ez di cîhanê de, bi mîzah û qarîkaturan de pir bi şohret bûm lê piştî mirina Mewlud û Omer min dev ji nivîsandinê berda û di 90 saliya xwe de min xelata Nobela Blogerîyê stand. Ji xwe min ew xelat ji bo Omer û Mewlud stand. (divê serê seatekê qapsula xwe bistênim)

Em ciwan bûn, fular têrî enteliya me nedikir. Hingî di her çar parçayên Kurdistanê de şer hebû. Hingî em nexwedî dewlet bûn, xwedî cafe bûn. Jixwe mala dewleta me ava ji ber ku em bi piranî diçûn leytek cafeyê, piştî mirina Mewlud kirin muze... Wê demê bi rastî jî Omer û Mewlud pir populer bûn. Wî zemanî min qet bawer nedikir ku herdû wê bi tenê û bê kes wê mirin. Lê gelê Kurd wan tu caran ji bîr nake...



Fig. 1.—Skeleton of Man.

POPirs

Berfîn Zenderlioğlu



Ji beşa Rexnegiriya Tiyatroyê û Dramatûriyê ya Zanîngeha Stenbolê mezûn bûye. Di kovara edebiyatê ya “Jiyana Rewşen” de xebitî. Ev kovar di bin banê NÇMyê de di navbera salên 1999-2003yan de derket. Demekê dersên deng, şan, tembûr û gîtarê girtin. Di navbera salên 2004 û 2008an de li Şanoya Seyri Meselê lîstikvanî, perwerdekarî û organîzatorî kir. Di 2008an de tevî Mîrza Metîn Destar Theatre ava kir. Lîstika ku herduyan nivîsî bi navê “Reşê Şevê” ji weşanxaneya Avestayê him bi Kurmancî him bi Zazakî derket. Di sala 2010an de pêşengiya avakirina Şermola Performansê kir. Heta niha di gelek lîstikan de derhênerî kiriye. Zenderlioğlu niha jî wek lîstikvan, derhêner û nivîskar xebatên xwe didomîne.

1-Peyva ku tu herî zêde jê hez dikî?

Payîz.

2-Tu dikarî kêliya xwe ya herî bextewar ji me re bêjî?

Piştî xebatê, qedandina lîstikeke û derketina li hemberî temaşevanan.

3-Tehemula te ji çi re tune ye?

Ji derewê re.

4-Te li vê dinyayê herî pir dixwest kê nas biki?

Gabriel Garcia Marquez.

5- Xeyala te ya herî mezin çi ye?

Çûyîna Uzayê.

6-Bi xêra xwe hevokeke ji strana ku herî zêde jê hez dikî bibêje?

“Tenêti karxezalek bû, nêçîrvanek hat nîşan lê girt, gavên min nagihêjîne.” M.Atlı- “Name” Abdullah Peşew

7-Çi kenê te tîne?

Kenê min bi bêfesaliyan(Sakarlık) tê.

8-Dengê ku tu herî zêde jê hez dikî?

Dengê xwezayê -çem, çivîk û dengê baranê-

9- Heke cardin bihatayî dinyayê, te yê çi tiştî cardin bikira?

Helbet şano.

10-Tiştê ku îlhamê dide te çi ye?

Rêwitî, hwd. Kuçe û kolan.

11- Dîmeneke çawa te aciz dike?

Trafik, qorneya erebeyan, zarokên karker.

12-Te dixwest tu li ku derê bijî?

Bi hevalên xwe re dûrî “siyasetmedaran” di nav xwezayê de, li giravekê.

13-Qisûra te ya herî mezin çi ye?

Eniyada min.

14-Tu dixwazî çawa bimrî?

Biharê, li bin darên kulîlkên gilyasan, bi guhdarkirina Laura Marling -What He wrote-, pişt re jî klama dengbêj Huseynê Farê “Were Tellî”. Hema pişt re jî mirin ser seran ser çavan.

15- Dixwazî çi li ser gora te bê nivîsandin?

“Min birînek di bîr dianî nizamim di singê kê de...” Keştîya Bayê.



CIHAN KAYNAR
cihankaynar7@gmail.com

Bi Vê Qûşê Naçî Mûşê

“heke hing zor bin em hingo ra zortir in”



Peyvên “Kurd” û “Lojî” di van salên dawî de exleb bi hev re tên emilandin. Ev navê Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ye ku li sê zanîngêhên (Mûş, Bîngol, Mêrdîn) Tirkiyê vebû û jê re bi gelemperî gotin Kurdolojî. Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî ew beş e ku personelek zanîngeha Mûşê ya ku di qisma karê xwendekaran (öğrenci işleri) de dixebite sê sal piştê vebûna beşê bi minasebetekê, ji xwendekarekî beşa kurdî dipirse; “aaa! Kürt dili mi var bu üniversitede?” Beşeke wisa utopîk e ku we got “Kürt Dili” kesê hember mecbûr dîsa dipirse “Türk Dili, hmm güzel güzel!” Carna jî ku te got “Kurdolojî” ya/ê hember te eger kurdek Wanî be lê li Entabê mezin bibe “Kardiyojî” fêhm dike. Yan jî ew beş e ku her roj ji we tê pirsîn “yaw niha hûn di dersan de Kurdî diaxivin erê? xoceyên we jî Kurdî diaxivin? Yanê Kurdî erê? Awha mîna me kurdî xeber didin

an Kurdiya akademîk? Hûn bi Kurdiya akademîk ji kevçî re dibêjin çî? Heval üniverste çî bû bi Kurdî?”

Zanîngeha Mûşê di sala 2013an de çil û yek xwendekar qebûl kirin ji bo beşa Ziman û Edebiyata Kurdî. Çil û yek xwendekarên Kurd di polekê de, 4 (çar) sal li ba hev... Bi tîpên zêrîn di dîrokê de neyê nivîsîn jî ev serkeftineke mezin bû. Heke em bi îstatîstîkan bêjin: “çardeh eşîr, (tenê ez bêeşîr bûm çimkî em şêx in...) panzdeh devok, sê zimanên arkaîk, heft dîne cuda, du heremê oblique, ekolên ergatîfparêz, zayendparêz, standartparêz, liheremamewihaparêz, terîqata anlıyorumkonuşamıyorum, rêxistina xeternak annetarafımkürt” gi li nik hev bûn.

Ev beş pêşî di bin navê Zimanên Zindî de, li zanîngeha Mêrdîne vebû, ya herî navdar jî ya Mêrdîne bû. Yanê beşa Kurdî ya Mêrdîne efsane bû, hinek

kesan digot hevalê me li wir dixwînin û bi vê yekê qure dibûn, hinekan digot me bi çavê serê xwe dîtiye! Tenê carna hevalên dinyadîtî ji me re behsa Kurdolojiya Mêrdînê dikirin. Eger ku beşên Kurdolojiyê her yek qonaxek be, ya Mêrdînê Ronesans bû heyran! Ew xwedî twît û floodên herî xweş ên kurdî û akademîk, xwedî wêneyên herî xweş ên Înstagramê û xwedî aforîzmayên Kurdî yên herî baş bûn di Facebokê de. Me heta dijûnê wan jî diciband û parçeyek ji akademiye dihesiband, çimkî Mêrdîn! Herwiha mezûniyeta xwe jî li gor standartên ODTÛyê çêkirin.

Bi belavbûna navê beşa Kurdî re meseleya “Kurdiya Akademîk” jî wek vîrûs belav bû û êdî bû pirsgirêkeke netewî. “Wêje yan edebiyat, ziman an zimên, ol an dîn, derbasî be an gêçmiş be..”

Sala ewil me navê her tiştê jî dikir Kurdî. Favoriyên min ev bûn; “ortodoxuya navîn, kesek ku paşnavê wî “Kaya” bûya dibû “Zinar”, ku navê wî Înan bûya jî dibû Bawer” Me ji bilgîseyarê re jî nav dît lê haya we jê nîne: “Agahjimêr.” Mijarên etimolojiyê ku bê delîl û mantiq heta Medan, Sumeriyan û Hz. Adem diçûn zehf xweş bûn. Ev nîqaş li ser medyaya civakî bi saetan, bi rojan dewam dikir û di dawiyê de gelek kes hev ji hevaltiyê derdixistin, bi ser de hev asteng jî dikirin û silava Xwedê jî êdî li hev nedikirin! Em jî werre bûn. Salên ewil, bi termînolojiya bavê min “mîna gûyê hirçê” bû.

Lê dema ku ez pê hesiyam Geverî ji bo qûnê dibêjin poz û dema ku em Serhedî behsa pozê (burun) dikin, yan jî ku em dibêjin “pozê min dixurê” Geverî dikenin û henekê xwe bi me dikin, êdî tu hêviyeke min nema ji bo Kurdiyeke standart û akademîk. Kurdî evqas “serobin” e. Beşa Kurdî hem ji bo sosyolojiya Kurdan hem ji bo sosyolojiya ‘ortodoxuya navîn’ mekanekî taybet e. (piştî gelek xebatên akademîk, mamosteyên beşê dest bi tespîtê wiha muezem kirin)

Her xwendekarê vê beşê mecbûr e bi kitêba Dirêj Mihemed a bi navê “Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê” re wêneyek bikêşe û wî rismî herî kêm du mehan li Facebokê, mehek li Twîterê, sê mehan jî li Înstagramê bike wêneyê profîla xwe. Li gel vê helbesta yerlî û millî ya beşê, helbesta Rênas Jiyan a bi navê “Janya” ye. Li gor tespîtên me; di her polê de femînîstek heye û di nirxandina romanên de hertim balê dikişîne ser “objebûna jinê” û civakê bi zimanek tund şermezar dike. Piştgiriya herî xurt deffiroş didin vê beşê lewra bi vebûna beşa Kurdî re, li Mêrdîn, Mûş û Bîngolê di firotina defan de zêdehiyek çêbûye. Em dikarin vê yekê jî li gor girîngiya muzîka kurdî şîrove bikin.

Wezîfeya eslî ya xwendekarekî/e beşa Kurdî ew e ku bi naskirina herfên erebî re di profîla xwe de navê xwe bi herfên Erebi binivîse. Wek; cihan جهان û di pola duyem de jî derbasê asta “Poet” û “Writer” bibe. Herdu salên ewil bi kelecana û şox û şeng derbas dibin, di pola sêyemîn de jî derdê Qpss û “ku çözümlü sùrecî çêbû dîsa atama çêdibin” dest pê dike.

Axir wek ku mamostê me li ber me hîn kirin: “folklor kurdî gelek dewlemend e” “folklor kurdî zehf girîng e” “hevalno folklor yanê ne folklor ekibi şaş fehm nekin hahaaha” “çanda devkî zahf xaş e” “ziman zehf tiştêk girîng e” “zimanê kurdî zehf dewlemend e”

Ciwanên ku dixwazin di profîlên xwe de navê xwe bi Erebi, Soranî, Farisî, Dimilî binivîsin, yên ku dixwazin bi pirtûkên Mehmed Uzunî re wêneyên xwe bikêşin, yên ku dixwazin pirtûkxaneyên xwe ya Kurdî sê rojan carek li gel şûşeyek çay parve bikin, yên ku dixwazin herem û devoka xwe temsîl biketin û heremên din şermezar biketin, yên ku dibêjin “ji heft gundan gundê me, ji heft malan mala me, ji heft birayan jî ez”, divê serî li Kurdolojiya herî nêzik a herema xwe bidin.

“Di wê demê de pišta pîrejinê lê bû.
Penceya bêzariyê dilê wê guvaşt.
Awireke sivik lê da û got:

-Las berî çend salan mir.

Hê jî girnijînê rûyê Las bernedabû.

-Lê ez sax im û vegeyame.

Bi rêçika xwîna xwe de vegeyiam.

Pîrejin ji vê gotinê neveciniqî.

“Tu vegeyayî?”

Bi çav ev pirsîyar rûbirûyî wî kir.

Las bi wateya “tu çima vegeyayî?”
wergirt.


-Vegeriyam da ku kûçikên welatê min
bi ser min de bireyin.

Da ku kûçikên welatê min zenda lingê
min bigirin.”

Eta Nehayî

Gulên Şoran





“JIBO MIN MESELEYEKE QELBÎ BÛ...”

Fîlma bi Kurdiya Zazakî ya bi navê “Hewno Bêreng” (Xewna Bêreng) di Festîwala Fîlman ya Stenbol û Enqereyê de hate nîşandan. Fîlm ji aliyê temaşevan û rexnegirên sînemayê ve hate ecibandin.

Fîlm di Festîwala Fîlman a Stenbolê de xelata “Mansiyon”ê girt û her wiha di Festîwala Fîlman a Navneteweyî ya Enqereyê de jî 6 xelat girt. Fîlma ku derhênerê wê Mihemed Elî Konar e, li festîvalê; xelatên baştirîn film, baştirîn listikvanê mêr, baştirîn senaryo, baştirîn derhêneriya dîmenê, baştirîn muzîka xweser û baştirîn filmê ya SİYADê girtin.

Me roportajeke piçûk bi derhênerê filmê Mehmet Ali Konar re kir. De kerem bikin...

- Em dikarin di destpêkê de Mehmet Ali Konar û sînemaya wî binasin?

“Ez ji Bîngolê me, emrê min 35 e. Dema min li Faqulteya Ragihandinê ya Marmarayê dixwend, min salekê dersên sînemayê girtin. Pişt re di somestra heyama 2005 û 2006an de min li Îtalyayê jî ders stendin.”

- Hewno Bêreng filma we ya yekem a metrajdirej bû û gelekî hat ecibandin. Beriya Hewno Bêreng çi hebû, em ê pistî vî filmî çi bibînin?

“Di sala 2010an de min kurtefilmek kişand, (Baba) Çîroka nivîskar Roşan Lezgîn bû. Di çend film û belgeselan de xebitîm.”

- Di filmê de Mîrza piştî mirina dayika xwe, naxwaze gelek hez ji yekî bike, çimkî windakirina hezkiriyên wî gelek tesîrê li ser wî dike. Lê Mîrza di rojên dawî yên Mîr Ehmed de, dibe hevalê wî û naxwaze ew ji mala wan biçe. Ev nîşana berdewamiya jiyana ye li gorî we?

“Ya muhîm ew e ku ne tene tirsekê, gelek tirsên Mîrza hene. Meseleyeke kompleks heye di wir de.”

- We film bi bûdceyê kê û di demeke kin de çêkir. Hûn dikarin hinekî behsa wê prosejê bikin?

“Rast e, tişteki gelek birîsk bû. Ev rîsk siheta meriv, jiyana mirov a sosyal jî tevliev dike. Ji bo min meseleyeke qelbî meseleyeke hîssî bû. Loma divê min bikira. Dixwazim vê pirse derbas bikim.”

-Ez bawer im filma we ku yekem car li 37. Festîvala Fîlman a Stenbolê hat nişandan, dê li festîvalên filman ên navnetewî, wek Festîvala Filman a Navnetewî a Duhokê jî were nişandan. We daxwaziya beşdarbûnê li tu festîvalên din kiriye û hûn dixwazin beşdarî kîjan festîvalan bibin?

“Belê di 37. Festîvala Fîlman a Stenbolê de, di pêşbaziya sereke de bû û xelata mansiyonê girt. Pêvajoya festîvalan hêj nû dest pê kir. Li festîvalên Ewropayê jî wê bê nişandan lê hêj tişteki tegez tune ye. Helbet ez gelek dixwazim filma min li Duhokê jî bê nişandan.”

- Li gorî we sînemaya Kurdî di kîjan astê de ye? Rewşa bakur di vî warî de li gorî perçeyên din ên Kurdistanê çawa ye?

“Nizanim. Fîlma ku min çêkiriye bi min re eleqedar e, wek kum in got ev meseleyeke dilî ye ji bo min. Bi giştî nikarim tişteki bejim. Jixwe li Bakurê Kurdistanê kêf hene. Ez dixwazim filmên min xwerû/saf filmên Kurdî bin.”

-Bila pirsê me ya dawî li ser zimanê, di filmê de me du dialektên kurdî dîtin lê helbet zêdetir Zazakî hebû û gelek kes an jî bo filmê gotin filmê yekemê Zazakî ye. Tu dikarî çî ji me re bibêjî li ser vê?

“Belê dema mirov dinyayê wilo fantastik diafirîne, jî gelek probleman (Wek lîstikvanên kuz iman dizanin, heyam û mekan) safî dibe. Di edebiyatê de jî vê re dibêjin “tarza xweziya zêde.” Li bajarê ku ez lê mezin bûm her du dialektên Kurdî jî hebûn. Ger di jiyana rasteqîn de bibe, helbet di jiyana fantastik de jî dibe.

Mala we ava, ez jî e-kovara POPKURDê re serkeftinê dixwazim.”



PopTweet



1

Analiza medyaya civaki...malik lê xirab kiriye



4

Em heyrana krîtera te ne



5

Hiiiihhhh



2

Bijî Yekîtiya Ezeban!



3

Çi dinyake pûç û vala...



6

Tenduristî li hemberî helbestê ye...



7

Hebûn ya ji tunebûn hemû mesele ev e



9

Ka bersivê bidin oxlim



8

Keçikên gundê me netewperwer in



10

Kesên ku xwe li Kurdî nadeynin bila bibin Körtük



Haydar bin; Ev reklam e!

Dara Production
 ji bo hemû çalakiyên
ÇANDÎ Û HUNERÎ
 di xizmeta we de ye



Hejmar: +90 545 625 7372
 e-Mail: darabandini@gmail.com
 instagram: @daraproduction1
 Twitter: @darabandini



HATİCE KILIÇ
haticekilicc48@gmail.com

HABÎTÛSA KURDAN



Em sê Kurd bûn. Li Stenbolê, sê namzetên doktorayê. Serê sibehekê me ji Starbucksê qehweyên xwe stendin û em ber bi jor ve bi inte intê hilkişiyân. Em di nava niqaşeke bêserî de bûn. Me di dirêjiya kolanê de dîrokê didewisand. Nîqaş bi Tirkî bû. Min çurtek ji espressoya xwe hilda û got “divê Kurd bibin dewlet.” Yê din got “Heya ku şoreşeke Jakobenî neqewime ez li gel Kurdan nasekinim. Nikarim olperestan, feodalan biparêzim.” A din jî got “Dewlet çi ye ya? Ez li dijî hemû dewleta me.”

Heçko hemû taloqdanên dîroka Kurdan kom bûn ket ser milê min. Em dûrî hev meşiyân. Ditewişîn em.

Çer ku nêrînên min bi stûyê min ê xwar re hilweşiya ser kevirên kevnare yê kolanê, Celadet Elî Bedirxan niqutî hişê

min. Teqez ew jî di vê kolanê re derbas bûbû. Sed sal bihurîbû. Ji nişkê ve dîrok vekişiya hundirê xwe, kin bû, ez û Celadet em li hev qelibîn. Ewî em nas nekirin. Meşiya, li biniya rê hûrik hûrik wenda bû.

Qisedana me ya bi helehel li ser pirtûka bi navê “Türklük Sözleşmesi” (Kontrakt Tirkbûnê) dest pê kiribû. Pirtûka ku rewşenbîrê Tirk Barış Ünlü nivîsiye. Dibêje ku Tirkbûn ne netewebûnek e, ne jî îdeolojiyek e. Tirkbûn hîskirin, fikirandin û tevgerîneke hevpar e. Civaknasê Fransî Pierre Bourdieu jî vê rewşê re dibêje habîtûs. Li gorî wî, hestên me, tevgerên me û şeweya fikirandina me ji aliyê şert û mercên derve (civak û dewlet) tîr sazîkirin û ku şert û merc biguherin jî taybetiyên me dibe xwezaya me (habîtûs) û xwe didomîne. Îdîaya Barış



Ünlü ew e ku Kontrakta Tirkbûnê bi vê habîtûsê dişixule û yên ku li dijî wê bisekinin an tèn cezakirin an jî li dûrî civakê dimînin.

Bi vê lêkolînê, yekem car Tirkekî zordestiya sistematîk a Tirkbûnê bi awayekî rêkûpêk eşkere kir, bi nav kir û avêt ber Tirkan.

Min pirsî ku “Çima vê pirtûkê Kurdekî nenivîsiye? Çima kêlên Tirkbûnê Kurdekî venekiriye? Halbûkî bi tenê bindest xwediyê agahiya serdestiyê ne! Qey Kurd ewqas ketine nava Kontrakta Tirkbûnê ku bûne korê Tirkbûnê? Kurd êdî habîtûsa Tirkan nabînin?”

Di pêşgotina bo pirtûka Frantz Fanon de Alice Cherki dibêje, heta ku encamên desthilatdariyê neyên zelalkirin têkoşîna li dijî desthilatdariyê bêkêr e. Ji ber leqînên min ên bihêrs du gulp ji espressoya min rijiya, ma gulpek. Min berê xwe da ê Jakobexwaz û got “Ev 50 sal e me hîn biryar nedaye ku em kolonî ne an nîn in!” Hilneda ser xwe. Barê min girantir kir.

A dewletnexwaz bi kelecânî li min zivirand, “Welleh hinek Kurd pir bê mantiq in! Ew yekê porgijik heye, rojnameger e,

nivîskar e çî ye, navê wî ji bîra min çû. Hema her tiştî bi Kurdan ve girê dide. Ev neteweperestî ye. Sosyalîstî ne tişteki wiha ye.”

Min got “Rast dibêji. Her tiştî bi Kurdbûnê ve girê dide. Ji ber ku ji Kurdbûnê diqete.”

Peyv li hev ketin, bêdengiyêke şêlû çê bû.

Min bi çokên xwe yên sist berdewam kir: Formeke Kurdbûnê heye, di nava bi dehan forman de a herî krîtîk. Di şerê ‘hebûnê’ de ev form nuansêkê dihewîne ku hîn nehatiye şirovekirin.

Kurdên bi vê formê, bi Tirkî, qala xeletiya qanûna Tirkan dikin. Qala xeletiya dîroka Tirkan dikin. Qala xeletiya rewşengeriya Tirkan dikin. Çîroka xwe ya dilşewat dirijînin ser hunerê. Şîmaqên zexm li dewletê dixin. Jîr in. Durust in. Wêrek in.

Ji ber vê jî, barê muxalefeta Tirkan sivik dikin. Wijdana wan dilorînin. Wan aş dikin. Hişê wan zelal dikin. Kêmasiya muxalefeta wan jê dibin û wan ‘temam’ dikin. Rewşenbîrên Tirk bi temsiliyeta wan digihîjin ‘Kurdên xwe’ û mîsyona wan diqede. Ew Kurd bi xwe jî, an bi aferîna Tirkan a bi kakil, an jî bi rexneya wan a xeternak xwe têr dikin, diwestin, disitirin û hebûna Kurdbûnê diguhere, formeke nû ava dibe: Nebûna dînamîk.

Ev ‘tuneyên dînamîk’ xwedî temsiliyetê ne. Xwedî dengvedaneke fermî û civakî ne. Hey diçin ber bi herdu aliyên sînorê ve berfireh dibin. Bazara Kurdî, bazara zimanê Kurdî bi vî awayê teng dibe. Bazara zimanê Kurdî loma nikare xwe berfireh bike.

Min qurta mayî ji espressoya xwe hilda. Tehl bûbû. Kengî li Starbucksê vexwim dawiyê de dibêjim ku “min jehra mirinê bixwara çêtir bû!” Min hewl da ku vê rewşê bi Kurdbûnê ve girê bidim. Lê meşiyam, ji deriyê zanîngehê ketim hundir. Ji hundirê xwe derketim. Dîroka duyem dest pê kir.



Tofan Sûnbûl **YÊRÎVANÊ YÊRÎVAN**

“Çûyîn”

Zivistan bû. 9ê Sibatê ji balafirgeha Stenbolê ji bo projeya Yekitiya Ewropayê (European Union – Erasmus) ez û 5 hevalên xwe em li balafirê siwar bûn û me berê xwe da Yêrîvana Ermenistanê. Piştî çûyina me ya Yêrîvanê teqez bû û demek nêzîk ma ji çûyînê re, hema bêje rojê sê danan ne xurînî, zikê têr dengê Ciwan Haco li ber guhê min bû:

“Peyv in, deng in, awaz in

Ceng in, leyz in, tinaz in

Yêrîvana min

Yêrîvanê Yêrîvan...”

Şev derengî em gihiştin Yêrîvanê, ji balafirgehê em li taksiyeke kevn û kûlistir a Sowyetê siwar bûn û çûyîn hotela ku ji bo kesên tevlî projeye dibin. Proje ji bo heşt rojan bû, rojên me bi atolye û çalakiyên înteraktîf derbas dibûn. Şev jî li Yêrîvanê jiyanek din a me hebû, ez bawer dikim îsal jî wek her

sal berf zêde bariyabû, sir û seqem bû. Avahîsaziya Ermenistanê di bin bandora Sowyetê de mabû, ji bîna û apartmanan û riyên eşkere dibû. Riyên Yêrîvanê gelek fireh bûn erebeyên kevn jî zêde bûn...



erebeyên kevn û rêyên fireh

“Ararat”

Jiyana şev a Yêrîvanê pir bi reng û coş bû. Şevên herî xweş bi taybetî li “Calumet Ethnic Bar”ê û “Hemingway”ê borîn. Bi pêşniyara hevalên Ermen em çûn Calumetê, komeke bi navê “Aratta Band”ê yê derketiya ser dikê û bi stran û muzîkên xwe dê millet bi kêf û coş bikiriyana. Bi rastî jî wisa bûn, li vî cihê entiqe me bi dengê vê komê nedizanî serma çî ye, her kesî li kêfa xwe dimey-zand, dans dikir. Şevên Yêrîvanê bi dengê Aratta Bandê diherikiya, jazzek ecêb çêdikirin...

Ji ber çiyayê Agiriyê, Ararat li wir gelekî dihat bikaranîn, ji bilî navê vê koma muzîkê navê cixareyek û eraqek Ermenan jî bi navê Araratê bû. Tişt a bala min kişandî ne cixare bû, markaya cixarê bû. Markeyeke din a cixareyî jî “Axhtamara” bû, yanî navê girava Wanê.



Calumet Ethnic Lounge Bar, wêne: facebook

“Peyker û Billboard”

Li Yêrîvanê hema bêje li hemû park, koşe û kolanên peyker hebûn. Hin peyker ên ronakbîran bûn, hin jî sembolên Ermenan bûn. Mirov bi dilrihetî dikare bêje Ermenistan qedr û qîmetê dide hunermend û nîrxên xwe. Min di nivîsekê de xwendibû, Yêrîvan bi “bajarê peykeran” hatibû pênasekirin, eynî welê bû.

Li ber deriyê Operaya Yêrîvanê (Yerevan Opera House) -avahiyeke gelek



Alexander Tamanyan,
avakarê Operaya Yêrîvanê, 1878-1936

mezin bû- peykerê Alexander Spendaryan hebû, ev kes bestekarê (kom-puzîtor) herî navdar ê Ermenan e. A. Spendaryan heman demê de damez-rênerê muzîka senfoniya neteweyî ya Ermenîstanê ye, wekî bavê muzîka klasik ya Ermenan jî têt naskirin.

Ji bilî gelek peykerên ronakbîr û nîrxên Ermenan li ser billboardên caddeyan jî wêneyên nivîskar, muzîkjen, şair, artist, peykersaz û derhêneran hebûn. Hem Ermenkî hem jî Latîni nav û sen'eta wan kesan hatibû nivîsin. Di billboardên li ser cadde û kolanên min dîtî de ev navên he hebûn: William Saroyan, Aram Khachaturian, Sergei Parajanov, Ara Sargisyan, Yervand Kochar, Charles Aznavour, Silva Kaputikyan, Alexandar Tamanyan...

Bi rastî jî ecêb bû lewre her tim li billboardên Stenbolê û bajarên heya niha min dîtî tiştên beredayî û reklam hebûn an jî bangewaziya partî û saziyan hebûn. Lê li Yêrîvanê 40-50 metre carekê te hunermendek an jî nîrxekî Ermenan nas dikir, kêfa min ji vê sîstemê re gelekî hat.



Silva Kaputikyan
Nivîskar û Helbestkar / 1919-2006

“Sembol”

Yek ji sembola Ermenan a navdar “hinar” bû, bi Ermenkî “nor.” Semboleke komkûjiyê ye, dibêjin em wek libên hinarê belav bûn û divê em wek libên hinarê dîsa werin ba hev. Dema mirov hinarê diqelişîne an jî libên hinarê belav dibin avek sor jê dirijî mîna xwîna tê rijandin...



12 stûn û agirê heta hetayê,
agirê dilê Ermenan

Sembola bîranîna komkujiya Ermenan jî li ser girekê bilind ê Yêrîvanê bû. Dirêjiya bîranînê 44 metre bû û bi wateya “vejîn”ê hatiye avakirin. Li teniştê jî girovereke ku ji 12 stûnan hatibû avakirin hebû, ev 12 stûn sembola donzdeh wilayetên rojavayê Ermenistanê yanî Bakurê Kurdistanê bû. Di nava vê giroverê de jî “agirê heta hetayê netimiri” (eternal flame) dişewitî. Êşa komkujiyê hê di dilê Ermenan de teze ye û dilê wan jî wek vî agirî her tim dişewite.

[lînka youtubê “ciwan haco / yerivan”:
https://www.youtube.com/watch?v=K-ax_WGRLsts]

[lînka youtubê “aratta band / aratta”:
<https://www.youtube.com/watch?v=8P-FjxnBq9VQ>]



POPNUÇE



“Hewno Bêreng” (Xewna Bêreng)

Fîlma bi Kurdiya Zazakî ya bi navê “Hewno Bêreng” (Xewna Bêreng) di Festîvala Fîlman a Stenbol û Enqereyê de hat nîşandan. Film ji aliyê temaşevan û rexnegirên sinemayê ve gelek hat ecibandin. “Hewno Bêreng” yekem filma Zazakî a metraj dirêj e. Film di Festîvala Fîlman a Stenbolê de xelata “Mansiyon”ê girt û her wiha di Festîvala Fîlman a Navneteweyî ya Enqereyê de jî 6 xelat girtin. Fîlma ku derhênerê wê Mihemed Elî Konar e, li festîvalê; xelatên baştirîn film, baştirîn listikvanê mêr, baştirîn senaryo, baştirîn derhêneriya dîmenê, baştirîn muzîka xweser û baştirîn filmê ya SIYADÊ girtin.

Hêjayî gotinê ye ku derhênerê filmê; kurtfilma ewil ya Zazakî (Baba, 2010) kişandibû.



Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê hat kirin

Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê di 13yê Nîsanê de bi belgefilma Hüseyin Tabak a bi navê “Efsaneya Çirkin Qral” (Çirkin Kral Efsanesi / The Legend of the Ugly King) dest pê kir. Festival cara 10emîn hat kirin û di 22yê Nîsanê de qediya. Festival cara ewil di 2001an de hatibû kirin. Di bernameyê de fîlmên wek “Radyo Kobanî”, “Binxet”, “Keça Êzidî li hember DAIŞê” û “Zer” hatin nîşandan.

Fîlma “Rûmet” bo Festîvala Cannesê hat hilbijartin

Fîlma “Rûmet” a ku bi çêkeriya Loran Medyayê û bi derhêneriya Kamiran Bêtasi hatiye kişandin, di Festîvala Cannesê de ji bo “Beşa Kurtefilman / Short Film Corner” hat hilbijartin.

Festîvala Cannesê 8ê Gulanê dest pê dike û heta 19ê Gulanê dewam dike. Hêvî ew e ku filma Kurdî bi xelat vegere. Em ji wan re serkeftinê dixwazin.



Hîner Selîm filmeke nû kişand

Derhênerê navdar ê Kurd Hîner Selîm filmeke nû ya bi navê “Kî Ledivanezley Kuşt” kişand. Fîlm di sal û nîvekê de hatiye amadekirin û di meha Hezîranê de wê li Parîs, Bruksel û paytextên din ên Ewropayê were nîşandan

Di filmê de listikvanên wek; Mehmet Kurtuluş, Ezgi Mola, Mesut Akusta û Korkmaz Arslan dilîzin. Piraniya filmê li Adalara Stenbolê hatiye kişandin.



Ji nav weşanên Avestayê pirtûkeke şanoyê derket

Sê listikên şanoyê yên Mîrza Metîn bi navê “Lîstikên Tomerî” ji nav weşanên Avestayê çap bûn. Di pirtûkê de sê listikên Metîn ên bi navê: Dîsko 5 No’lu, Bûka Lekî û Gor hene.

Encamên yekemîn Xelata Wêjeyê ya Ehmedê Xanî eşkere bûn


Ji bo piştgiriya edebiyata Kurdî, bi organîzatorîya Pirtûkakurdî.comê , Xelata Wêjeyê ya Ehmedê Xanî di cureyên roman, çîrok û helbestê de hatin dayîn.

*Di helbestê de berhema bi navê “Havîna li Serfêza Behrê” ya Rizgar Elegez,

*Di çîrokê de berhema bi navê “Guleyşa” ya Rehmî Kurdziman,

*Di romanê de jî berhema bi navê “Bîr” ya Nûdem Hezex xelat girtin.

Ev xelat cara ewil tê dayîn. Merasîma xelatdayînê jî dê di meha Îlonê de, di fûara pirtûkan ya TÛYAPê de bê kirin.



“Chalak Art Cafe”ya Chalakeventsê vebû

Xwendekarên zanîngehê yên li Stenbolê bi navê “Chalakeventsê” li ser ziman, kultur û edebiyata Kurdî bername, çalakî û xebatan dimeşînin. Platform li cihên cuda çalakî û bernameyên xwe çêdikin. Yanê li her cihê mazûvan bûn îja bûn xwediyê malê. Wan li Beyoğluyê “Chalak Art Cafe” vekir. Mal û mekanê wan li ser xêrê be. Xwedê hez bike em ê wek ekîba POPKURDê di demeke nêz de biçin serdana wan û çayeke wan vexwin.

Li ser hesabê xwe yê instagramê ev danezan belav kirin: “Em ê di demeke nêzik de bi bername û çalakiyên cur bi cur li pêş we bin. Bo heval û dostan zahf spas. Êdî hûn dikarin werin li cihê xwe “Chalak Art Cafe” rûnin, suhbet bikin. Em li benda we ne.” (<https://www.instagram.com/p/BhUeKu9AjGL/?taken-by=chalakevents>)

Herwiha Chalak Events çalakiya xwe ya yekemîn a li cihê xwe yê nû “Chalak Art Cafe”yê bi pêşangeha wêneyan a Seywan Saedian li dar xist.

Nizamettin Ariç albumeke nû derxist

Hunermendê bi nav û deng Nizamettin Ariç ji helbestên Seydayê Cegerxwîn albumeke nû derxist. Albuma Ariç ji aliyê Teyra Produksiyonê ve derket. Album niha li benda guhdarên xwe ye.



Ji nav weşanên Nûbiharê du kitêbên nû derketin



Nerit û Helbest / Nerita Neteweyî di Helbesta Nû ya Kurdî de (1880-1970)

Li gorî agahiyên ku me li ser malpera weşanxaneyê bi dest xistin agahiyên li ser kitêbê de ev in: “Ev xebat îdîa dike ku digel hemû astengî û diwariyan, mirov dikare behsa nerîteke hevbeş a edebiyata Kurdî bike. Bêguman ew ruhê ku vê nerîtê zindî dike hizra neteweyî ye... Loma jî di destpêkê de nûbûna helbesta Kurdî di çarçoveya nûbûna naverokê de pêk tê û di cewhera nûbûna helbestê de jî hizra netewetiya nûxwaz heye.”

Nivîskarê kitêbê akademîsyenê beşa Kurdolojiya Mêrdînê Zülkûf Ergün e. Kitêb di 23yê Adarê de ji nav weşanên Nûbiharê derket û 264 rûpel in.



Gotarên Zimannasiyê

Ev xebat di warê xwe de yekemîn e. Her çi qas heta niha li ser gramera Kurdî hin xebat hatine kirin jî, rasterast li ser zimannasiyê berhemeke wisa nehatibû amadekirin. Di xebatê de di çarçoveya dersên zimannasiyê ya bernameya doktorayê de pêşkeşî, nîqaş û nirxandinên komeke xwendekarên doktoraya zimanê Kurdî cih digrin.

Ev berhem, berhemeke edîtoriyal e. Edîtorên xebatê Kenan Subaşî (Kenanê Nado) û Resul Geyik in. Her du jî akademîsyenên beşa Kurdolojiya Mêrdînê ne.

Romana “Gêjevang” a Omer Dilsoz derket

Li gorî metna ku weşanxaneya Lîsê derbarê pirtûkê de amade kiriye; “Omer Dilsoz, vê carê bi romana xwe Gêjevang dikeve dora kaniya Kurmanciyê. Gêjevang, zeman, mekan û qewamê di gêjgerînga ruhê xwe de dimeyîne û li kujiyên nepen ên giyanê şikestî jî pirtik û piçîkên qewamên ji zeman û mekanên cihê cihê rûberekî ava dike û tîne di şikefta Gêjevangê diltenik de distewirîne.”



Du kovarên nû yên Kurdî dest bi weşanê kir



Kovara Dilopê

Kovar roja Newrozê (21ê Adara 2018an) bi mottoya “Dilopek di deryaya mirovahiyê de!” bi zimanê Kurdî û Tirkî dest bi weşana xwe kir.

Xwedî û berpîrsê kovarê Süleyman Çoban, edîtor jî Vedat İlbeyoğlu û nivîskar Reşo Ronahî ne.



e-Kovara Çandnameyê

Kovar bi slogana “li pey şopa bav û kalan” derket. Çandname kovareke dijital û demsalî ye. Kovar di 24ê Adarê de li ser malpera: <http://candname.com/kovara-candnameye-jimar-1/> hat weşandin.

Xwedî û berpîrsê kovarê Firat Bawerî ye. Di edîtoriyaya kovarê de jî Paşa Amedî, Firat Bawerî, Abdullah Araf û Ridwan Xelîl hene.

Em wek POPKURDê ji her du kovarên nû re serkeftinê dixwazin...



“Siya” Rojdayê derket

Stranbêja navdar Rojda, bi navê SIYAM albumeke nû derxist. Rojda ji bo navê albuma xwe dibejê; “Heta ku ronahî hebe wê siya me jî hebe. Bi navê “Siyam” min xwest ez îroniyekî jî bikim. Wekî ku em nikaribin ji siya xwe qut bibin em nikarin ji paşeroja xwe, ji çanda xwe jî qut bibin.”

Bagerê heft salî dixwaze bibe pîyanîstekî navdar

Bager Çalîşlar heft salîye û ji Mûşê ye. Ji roja dayik bûyî vir ve çavên wî nabînin. Lê taybetmendiyêke Bagerê Mûşî heye; çavên wî nabîne lê piyano lédixe. Her wiha guhê Bager ji bo muzîkê gelek kêrhatî ne. Dikare hemû dangan wergerîne notayê û bike melodî. Bi saya vê taybetmendiya xwe Bager niha bi awayekî serleftî li piyanoye dixê. Aramanca Bager ew e ku bibe piyanîstekî mezin.



Şahiya Çandên Stenbolê bi rê ve çû

Di Şahiya Çandên Stenbolê de nûnerên dinî, bawerî û çandên cuda ên Stenbolê li Kampûsa Zanîngeha Bîlgîyê ya Stenbolê de hatin bal hev. Di şahiyê de atolye çêbûn, kurtefilm û belgefilm hatin nîşandan, helbest hatin xwendin û konser hatin saz kirin.


Şahî bi piştevaniya Anadolu Kultur, Weqfa Civa-ka Zelal û Serkonsolosxaneyê Swêdê; di navbera 27-28 û 29ê Nîsanê de li Navenda Kurkîtinê Ci-vakî ya li Kampûsa Zanîngeha Bîlgîyê bi rê ve çû.

<https://www.bilgi.edu.tr/tr/etkinlik/7909/istanbul-kulturleri-senligi/>

Li Stenbolê bi organîzatoriya Dara Productionê şeva rapa kurdî hat çêkirin

Ronî Artîn û Reqso stranên xwe gotin.





Harun Beyhan ji bo
POPKURDê xêz kir.